Xizmeta Perwerdeya Gerok (SEI), yek ji xizmetên Weqfa **LES PERCE-NEIGE** e.

Ew piştgirîyê dide hemî zarokan, ji jidayikbûna wan û ta sala yekem ya dibistanê, ji bo liberketina li ser pêşketina wan û / an jî zehmetîyên wan yên naskirî.

Mamoste bi hevkarîya dayik û bavan û bi rêya rûniştinên heftane yên li mala zarokan piştgirîya perwerdeyî û pedagojîk pêşkêş dikin.

Karê wan ev e:

- Bi rêya lîstok û çalakiyan li pêşveçûna zarok temaşe bikin, pêwîstîyên wî nas bikin û jêhatîbûna wî xurt bikin. Ev yek ji bo pêşxistina xweserîya wî, başbûna wî a kesane û entegrasyona wî ya civakî û perwerdeyî ye.
- Derfeta guhdarîkirina li dayik û bavan peyda bikin, piştgirîya çavkanî û pêkanên malbatî bikin û wan bihêztir bikin, eger pêwîste be, ji wan re xizmetne din jî pêşnîyar bikin.

Mamosteyên **SEI** bi şêweyekî xûşkûbirane bi dayik û bav û pisporên din yên bi zarok ve mijûl hevkarîyê dikin.

Piştgiriya herî dereng piştî salekê ji çûna zarok bo dibistanê bi dawî tê. Ev xizmet jibo dayik û bavan belaşe û ew li ser daxwaza wan ji **SEI** tê organîzekirin.

Service Educatif Itinérant / Xizmeta Perwerdeya Gerok

Rue des Saars 131

2000 Neuchâtel

032/886 67 16